



ENCÛMEN



Ji weşanên Nivîsgeha çand û Ragihandina Encûmena nîştîmanî kurdî

Weşanên siyasî - çand - huner - civak - wêje

Sernivîser-Yusra Zibêr

Lêvegera Ziman- Mihemed Kose

Desteya birêvebir

Ferhad Şêxo

Mihemed Kose

Ji bo têkiliyên We bi Me re

Li ser Amêlê

Rojname .enks@gmail.com

Jmar 10

pêşgotin

Çi li dû Vekêşana Emrîkiya ne ? Serokê Wlatên Emrîki Trumb Niyaza xwe ne diveşart ku wê Hêzên Wlatê xwe vekêşene Dema ku Nemana Da,îşê bênin , û tu Grêdan di navbera mana wan û mana Rijêma Esed ve yan Barkirna wêve ne didanî ,lê beravojî vê di her Derfetekêde dida xuyanî ku dive Hevbendên wan Ereb Xerçkîrnawan Hêza bi xwe bigrin û Evroba Pişikdariya Qadeyî firehtirbîke li ser Zemîna Suriyayê. Lê Serok Trumb bê û Sala 2018 bi dawî bêne bi Biryara Vekêşanê evna Biryarek bû hemî Dîtin buhûrandin ji bal hemî Rexên di Milmilana Sûriyê dene çi Hevbendên Welatên yekgirtî yan Neyarên wan bin . Gelo Rêveberiya Emêrka ci dixwest ji Biryara Vekêşanê ya ku Dever tevde hejand û hemî Qaxez tevlihevkerin ,û çi ji me Kurdan tê xwestin da em xwe amadekin ji Qonaxa piştî Vekêşanê ji Rojhilata Fûratê da em bikarin Çarenûsa Kobanê û Evrînê mergezat dûr bixin ? 1_ nayêt veşartin ku Protokolek mezin bûye di navbera Emêrka de û Turkiyaê de li ser çend Doseyan wek Protokola Mûşekên S400 û Batiryot Tagirkirna Turkan ji Rojavayê Kurdistanê re Nimizkirna Êrîşa Turkiyayê li Erebestana Si,ûdî û ev yek Têkiliyên herdu Welatan divegerêne wek Dema bihûrî bi hêz. 2_ Bazdan ji Pişikdariya Berpirsiyariya Dûbarkirna Avakirna Sûriyayê û dihêle Si,ûdiyê rahêje Barê wêna. 3_ Bêhtirkirna Fişara Abûrî û Serbazî li ser Rûsiyayê bi Sînyarokê bihtir nêzîkî Sînyaroya Avxanistanê ta kû Rûsya bi karanîn hevkarbe bi Derxistna Hêzên îranî ji Sûryayê . 4_ Hevbendên xwe yê Evrobî û Nato bi ser Lîzana Rolek bi hêztir dehfbide li hember Desttêwerdana Rûsî û Îranî li Sûriyayê. Li ser Dûrbûna xuyayî Rexê Sûdmend li paş Emêrka ewe Turkiya ye û di peyre Rijêma Esede jiber ku wê Xaka kontrolkirî ya dibin Destê wande wê bihtir bibe bê Goman. Li hember vêjî Aliyê bihtir wê bişke û Ziyar pê bighe ew Miletê me yê kurde heger em bi awakî serkeftî û bilez nikarbin Berê kurd navxweyî yekbikin li Hember vê Tagirkirna Çavder li Tiştaya mayî ji Kurdistana Sûriyê heger ji bal Turkiya be yan ji bal Rijêmê be . Li hember Serhişkbûna PYD bi redkirna Derbasbûna Pêşmergekên Rojava û Erêkirna wan bi çi Sîwaneke dî ji bilî Sîwana kurdî_kurdî gelek Hevî nayên dîtin ku Çarek peydabibe bikare Miletê me ji Dojeya Êrîşa Lêşkerê Turkî û Girûpên Kedxwar pêve grêdayî yan ji Vegereke Rijêmê tolgerên mirtalbîke piştî qurbanîdan bi Xwîna dihên hezaran ji Xortên me yê Qehreman di Şer û Qadeyên tu Têkilên Berjewendiyên Miltê kurd û Doza wî ted nebû , bilî heger Encûmana niştimanî kurd me nişkevîn bike ku Qaxezne bi hêz di Destên wê de hene heger PYD Qîma xwe neyêne bi Karê Çarenûsî hevbeş wê diriya Têkiliyên xwe yê Kurdistani û Nêvdewletî Rewşek nû Serbazî û Siyasî peydabike dibe ku Miletê me û Xaka me ji Piyên Hovan bi parêze yê ku neyartiya Hebûna Miletê me û Xewna wî bi Jiyanek Azadî sebest wek hemî Miletên Cihanê . Di Dawî de Dîrok dilovaniyê bi tu Kesîre nake û wê tomarbîke ji her Kesîre bê çi ji xwere tomarkirye çi Qurbanîdan be di Riya Azadiya Milet de û yan xwe kirbe Destekek Neyaran hatiye avêtin Dema ku Rola wî bi Dawî hat.



D. Mûnîb Ehmed



Alaya kurdî



Milête kurd tê naskirin bi dilsozî û wefadarî yê ji Ax û Ala xwe re, bi salane Xebat kiriye ji bo bindestanîna mafê xwe û rizgarkirina welatê xwe ji destê dagirkeran Gelê kurd di serkeftinê xwe û cejin û şahiyên de bi serberzî Ala Kurdî bilind ber bi jor ve Berz kir ye. Ala kurdî taybet mendiyeke cawaz di Dilê Kurdistaniyan de heye, li seranserê Axa Kurdistana piroz de. di despêka sedsaliya 20 an de gelê kurd wek gelanê Cihanê kar û xebat kir ji bo Kurdistaneke Azad û ev Kurdistana ku daxwaza her kurdekî ye Alek jê re divabû ,di kombûneke li Stenbolê sala 1919 an de Komela rêxistina civakî ya Kurd (Komela Te'alfî Kurdistan) ku serokê komelê di wê demê de Mîr emîn Alî Bedirxan bû di gel jimarek havalên xwe rengên Ala Kurdî bijartin. di salên 1927 -1930ê de ji Aliyê Rêberê Serhildana Agirî General Ihsan Nurî Paşa ve li ser Çiya yê Areratê hat hildan. di sala 1932an de Mîr Celadet Bedirxan Ala Kurdistan li ser rûpela Kovara Hewarê jimara (11)an ya ku li Şamê dihat belavkirin dana ye .Li Meydana Çarçira di sala 1946 an de ji Aliyê pêşwa Qazî Mihemed û hawriyên wî di roja binavkirina Komara Mehabad hatiye bilindkirin. di 9/6/1999an de bi fermî biriyar hate pesendkirin ji Aliyê hikûmeta Herêma Kurdistana başûr ku Ala Kurdî li ser avahiyan û destgehên hikûmeta kurdistanê were hildan û biryar hate standin ku roja 17.12 ji her salê bibe Roja Ala Kurdistanê. Tê zanîn ku ev roj bû pêşewa Qazî Mihemed Ala Komara Mehabadê radestî nemir Mustafa Berzanî kirye . Roja 17.12 Kurdistani li her derî bin bi Ala Kurdistan derdikevîn kolanan û Kêfxwşiya xwe bi Ala xwe ya piroz dikin û wekû Cejnê bibîr tinîn.

Serhan Isa: Kurd û Şûreşa Sûrî Xelesa 7

3. Qûnaxa Sozên Rêjîmê

Kesên ku sivkahiye bi aqilê Kurdan ye siyasî û ezmûna wî ya têkoşer dikin pir nezan û hov in, erê kêmkasîyên tevgera siyasî ya Kurdî hene, erê em ne li ser hev in, lê em in yê ku em yê mîna Reikaberîya Sûrî û rêberên wan jî fêrî siyaseta û têkoşîna dikin.

Piştî derbasbûna çend meha di ser Şûreşa Sûrî re, Rêcîmê doza hevdîtîna li partiyên kurdî kir. Kêmkasîyê em naxwazin derbasî wê qûnaxê bibin û bi hûr û kûr li ser rawestîna, tiştê herî girîng û pêwîst ew e ku Kurdan xwe nefiro. Û divê em her timî vê rastîyê mîna Şûrekî di nav Çavên Rikaberîya Sûrî de lêxin. Tevî ku ev derfeteke dîrokî bû ji Kurdan re, û dibe ku karîbûna hindê qezencên mezin ji mîletên xwe re bidestxînin, bi tayîbet Rêcîm wê çaxê di rewşeke xirab de bû. Xaleke pir girîng û ji bo dîrokê em ê bêjin, dibe ku hinek Partiyên dixwestin ku herin hembêza Rêcîmê, lê dawî helweste giştî bi ser ket û hevdîtîna bi Rêcîmê re hate red kirin. Her weha ji bo xapandina Kurdan û raya giştî, Rêcîma Şamê di 07.04.2011 an de biryara Numre 49 deranî, a ku dibêje gereke Nasnameya Sûrî bidin Kurdên bê Nasname. Piştî Rêcîm neçar ma, û Kurdan jî di 26.10.2011 an de Encûmena Niştîmanî Kurdî li Sûriyê damezrandin, û derbasî Koalîtion a Sûrî bûn bêguman piştî imzekirina peymanêke bi wan re, Rêcîmê berê xwe da PYD ê û peymanêke dûr û dirêj û pir xeter bi wan re girêdan, ku ew di encamê de kirin Polîsê xwe anku Bodyguard ê Rêcîmê di herêmên Kurdî de. Anku em li vir li himber du Şepola ne:

1. PYD
2. ENKS

Wekî ku me li jor anî ziman PYD biryara xwe sitandin û bûn zîlamê Rêcîmê.

Û **ENKS** jî biryara xwe sitandin û tevî refê Koalîtion a Sûrî û Şûreşê bûn.

Li ser têkiliya PYD û hemî pîlan û kiryarên PYD em ê di xelekeke din biaxivin.

Derencama vê xalê ew e, ku Kurdan (**Şepola Netewî, ENKS**) bi ne bi sozên Rêcîmê û ne bi ye Rikaberîyê nehatin xapandin, û berdewam in di têkoşîna xwe ya siyasî de.

4. Qûnaxa derbasbûna partiyên siyasî Kurdî li ser hêla Şûreşê

Kurd ne bê peyre û program tevî Şûreşa Azadî û Rûmetê bûn, Kurdên Sûrî xwedî ezmûneke siyasî û rêxistinî berferê û zengîn in, her weha ev ê ezmûnê ew fêrî wê yekê kirine ku ew tu carî nikarin bawerîya xwe bi sozên rêcîmê binin, û ne jî bi Rikaberîya Sûrî. Rêcîma Sûrî ji Adara 1963 an ve û hetanî Adara 2011 an Kurd nedîtîna wek hemwelatîyê vî welatî, û di rîya projeyê û yasayên nijadperest û nemerovane, û awarte de, bi hemî hêza xwe hewildanên jiortêhilanîna û Asimlasyona mîletê Kurd kir. Lê di heman demê de jî tucarî tevgera siyasî ya Kurdî li Sûrî ji rêçên karê siyasî ye Demuqrasî û sîvîl

dernekt, û qet rojekê nekete peyre û programê wê de ku dest bavêje xebata çekdarî, an jî tund û tûjiyê

di xabata xwe de. Her weha tu carî ev ê Têvgerê doza **Cudabûnê (انفصال)** ê nekiryê. Daxwazên wê berya Adara 2011 an ev bûn:

1. Jiortêhilanîna pîlan û projeyên nijadperest yê ku di herêmên Kurdî de hatine cîbicîkirin, û zîvirandina mafên Cotkar û hemwelatîyên Kurd li ser wan salên ku zîyan tê de dîtine. Mîna **Kembera Erebi**, (biryara Numra -521- dîrok, 24.06.1974 an) ku li ser dirêjahîya 275 KM û



2. ferehbûna 10-15 KM 4000 Hezar malbatên **Erebên „Xemir“** hatin bi cî kirin, anku bêtri ji 40000 Hezar mirov hatin herêmê, **û 36 Gund** ji wan re hatin avakirin, û 335 Gundên Kurdan ji vî Projeyî ziyar dîtin.
3. **û Serhijmara Awarte** (biryara Numra 93 an di 23.08.1962 an de hate cîbicîkirin ku di encamê de bêtir ji 300000 Hezar Kurd Nasname man.
4. Dirkenî bi hebûna miletê Kurd û mafê wî du Destûra Sûrî de wek pêkhata diwemîn di Sûrî de.
5. Serbestkirina ziman û çanda Kurdî
6. Vekirina Dibistan, Zanîngeh û Institut an di herêmên Kurdî de.
7. Pûtepêdan û avakirina hêrêmên Kurdî.

Daxwazên Tevgera siyasî ya Kurdî li Sûrî piştî Adara 2011 an, li gel şert û mercên serdemê û li ser astê çareseriyê ji pirsgerêka Sûrî re hinekî hatin guhertin, ew jî ew bû ku Kurdan doza Sûriyeke, Yekgirtî, Demuqrat, Ferehhizbî û Perlemanî kirin, ku tê de mafê miletê Kurd di Destûrê de bê çesipandin û teqez kirin. Anku di piraktîkê de dîsa em ji çarçewa wan daxwazên berya Adara 2011 an dernekin.

Her weha **Rikaberîya Sûrî** û Rikaberên Sûrî bi şêweyekî pir Radîkal û Nijadperest nêzîkî pirsra Kurdî dibin, û bi hemî imkanên xwe hewil didin Dîroka miletê Kurd li Sûrî û pêvajoka têkoşîna tevgera siyasî ya Kurdî berîvajî bikin û şaş ji xelkê re ragihînin. Û peyva wan a pêşî û dawî ew e: Kurd bawerî bi wan nayê, Kurd doza **Cudabûnê (انفصال)** ê dîkin. Û ji wan re Kurd her **Kurdên Berzanî** ne, an jî **Ocelan** in. Dêmek ev Rikaberî bê ojdan û insaf in, ji bo dijayetiya Kurdan û berîvajîkirina rastiye propagandayeke bê westan dîkin. Û bê guman mirov dikare di vir de gelek mînakên bîne: Ango bi wateyeke din ji her Çar aliyan ve Agir li Kurdan dilieyize.

Rêvebiriya Xweserî û PYD û YPG û QESD, Ev hemî nema weke berê dimînin, û Nan û xwêya wan di Sûriya nû de wê tune bin.

Agirê:

- 1- Rêcîmek Diktaor û xwînmij.
- 2- **Rikaberîyek pir Ehmeq û Nijadperest û tundrew.**
- 3- Tunebûnê helwestekî navdewletî piştgir ji Kurdan re.
- 4- Û Agirê herî dijwar, Agirê newekhevî û neyekrêziya mala Kurdî.

Ruhê şûreşgerî: ji vê nerîna ku me li jor anî ziman, tê xuyakirin ku **Rêcîm û Rikaberîya Sûrî** li ser mafê miletê **Kurd** li Sûrî yekra û nerîn in, lê dîsa jî Kurd bi hemî vîn û imkanên xwe tevî rêzên Şûreşê bûn, lê mixabin Kurd jî mîna hemî pêkahtên Sûrî û mîna tevaya cîhanê di xwendin û pîvanên xwe de ji Şûreşa Sûrî re Şaş çûn, û êdî eger Tevgera siyasî ya Kurdî di vê Şêlûbêlî û sistiyê de bimîne wê vê qunaxê jî ji dest berdin. derencama vê xalê ew e, îro roj encama karê **ENKS** Kurd bûne hêzek û Numreyeke pir bi hêz di Pirsgerêka Sûrî de, ku êdî tu kes nikare wan piştguh bike. Îro hemî aliyên têkildar bi pirsra Sûrî re gihiştine bawerîyeke mukum ku divê pirsgerêka Sûrî bi rêçên aştîyane bê çareserkirin. Ev rêçik bi danîna **Destûreke nuh** dest pê dike, ku wê Kurd xwedî hêz bin tê de, û qet wê ew **Destûr** ronahiyê nebîne eger **mafê Kurdan** tê de newê çesipandin û misogerkirin.

Her weha eger hat û hêzên navdewletî xwestin leşkerekî ji bo parastina herêmê ava bikin, bêguman wê **Pêşmergên Roj** tê de Stûna navê bin.

Ji layê din ve ev a ku nav lê dîkin **Rêvebiriya Xweserî û PYD û YPG û QESD** ev hemî nema weke berî dimînin û Nan û xwêya wan di Sûriya nû de wê tune bin.

be. Ji ber ji bilî Iran û Rêcîma Sûrî tu kes wan napejirîne. Ne Rikaberîya Sûrî û ne Pêkhatên Sûrî û ne Tûrkiya û ne Raya navdewletî wan napejirîn.



DERIYEK JI DERIYÊN ROJ AVA YÊ KURDISTAN)SÛRIYÊ

..... bi Pênûsa Mehmûd Oso

Piştî KU parçe bûna kurdistanê di bin siya peymanê (SEYKIS - BÎKO) sala 1916 de di navbera 3 welatên nû avabûn, JI Ambaratoriya osmaniya îslam qetîn, Sûriya -Îraq -turkiya, û parçaya dî ma li Îranê de berdewam dimîn e. di va rewşana de pêşveçûnên nû pêk hat û cureyên cuda cuda pêk hat û taybetmendî JI bo her

deverek çêbû, û piştî sînora di navbera dewletên nû de hat saz kirin û çasbandin li gorî hevberdiyên nav dewletên û li gorî berjewendiyên hêzên dinavdewletî bi karanîn . Li hêla aliya parê Sûriya yê ezê Gotûbêj bikim û hînim ser ziman!!!! Çawa têkoşîna siyasî dest pêkir dema sûriyê di bin deshilata dewleta Firansîz da bû tevî hat nasîn û li ber çavan KU roja damezirandina yekemîn partî di sala 1957an de hatî xuyakirin, lê belê kurd û têkoşîna kurd hema di wa dîrokî dest pêkir lê Çawa????? Partî dîroka çasbandin sînora rweşa kurdên sûriya hema dest bi nîşana kar û xebatê kirin, livek girîng di navîna rewşenbîrên kurda çêbû û hat damezirandin bi şewekî komeleyan kultur û candî dest bi nîşan kirin û di dest pêka çerxa 20 tan bû!!!! Lê hema di bin bernema civakî bûn û bi raz karê siyasî bi kardihanîn, û gekek nama birêkirin JI nûnerên Firansa li sûriya û rê fikirin JI bo têkdarî bibin bi wanre û daxwaza xwe nivîsandin KU bi çî ton û awayî nafên kurda pêk bînin, û di hevkêşa nû kurd rola xwe hebin wek yek nîrx û hevrêz bi hemî hewlatiyên KU li sûriya yê dijîn û hema ne bi razîbûna kurda ev rewşa nû pêk hatî . Çima di wa dema de karê siyasî raz bû û veşartî bû JI ber dewleta Firansîzê siyasî qedexebû û binçavkirin hebû HWD. JI ber van yekan forma çandî û werzişî pêk hebû . Serdemeke zordarî û êşkence û rêza AXên kurda dijî karê rewşenbîran radiwestîn û xwe dan xulamî û nûkerî JI dewleta Firansa yê kardikirin dijîn kurd û kurdistanê . Ya herî neyaze û girînge di sala 1927 a bi navê komeleya xweybûn dest bi kar û xebatê kir JI kesên rewşenbîr û serkên eşîran; lê biryar ne Ya kesên welat parêz bûn JI ber hişê zingar û eşîrtî serek bû JI ber wê ti sude nedî li ser para heyîn û daxwaza wan ber kurdistanê turkiyê bû. Û gelek komele çêbûn di wa demê de lê hema kar ne wek demê dizîfriya, ROJ bi ROJ tiştên zor û azar pê da tê û piştî şerê cîhanê duyemîn radiweste dewleta Firansa yê JI sûriya yê vedikişê û bûyerên nû dest pêdike vê Ca nakokî û rikdarî di nav kurd û rijîmên sûriyayê çêdibe; ji ber rijîm neda di zagonê bi ziman û nivîsan û mafên kurda bi carekê nedan biryar li sûriya yê . Demek bû ji nefret û kîn û tol dijî kurda dest pêkir . Lê hema di nav çarçoveya dewleta sûriya da bû û daxwaza kurda ji wa cihê nehat. Bi taybet piştî partiya AB'AS AL 'ARABÎ AL ÎŞTÎRAKÎ di sala 1963 hat ser rijîmê zêde kurd astengî û zordarî dîtin bi carekê nehiştin kurd serî xwe hildin; ne ew tenê li serê kurda kirîz kirin lê PARTIYA AL ŞOÎ Û AL QEWMÎ AL SORÎ li kurda astengî kirin . Lê hema berî wê demê rewşenbîrên kurda partî yek li darxistin di sala 1957 an roja 14 /6/1957 . Ji ber zilm û zorê li serê kurda rawestîn û şemzarkin ji refên yekemîn :D -Noreddîn Zaza, Osman...




Ferhad Şexo

Emerîka wan di xizmeta berjewendiyên xwe bikartînin

Kurdistana Sûriya

"Rojavayê çemê Firatê" û metirsiya pêşerojê..

Di lîstokên Siyasî li seranserê Sûriya yê tenê lîstin li ser rûyê vê zemînê û tenê bikaranan ji dewletên zilhêz di warê ramyarî û aboriya cîhanê de mîna " Emerîka, Rûsya, Çînê, ", tenê gel û millet bûne qurbanî û bacê didin , û milletê kurd jî bûn qurbaniya siyaseta yekalî û îdiyolojîya Partîya Yekîtiya Demokratîk (Pyd) , ya ku li dijî pirojeya niştîmanî Kurdî kar dike, û maf û azadiya gelê kurd wundakiriye di riya pirojeya netewa demokratîk...!!! û valakirina herêmên kurdî ji xort û ciwanan bi sedema leşkeriya neçar, û cenga ku li li dervî cuxrafiya Rojavayê Kurdistanê kirin û hejmarek mezin pakrewan danîn ji ciwanên Kurd ji ber ku di despêkê de bi yekrêzî, wefadarî, neteweyî û kurdayetîyê xebat nekirin , tenê di bin siya berjewendiyên dewletê faşîst "rêjîma Sûriyeyê û Îranê " dixebitin, ku li dijî mafê gelê Kurd in yê li ser xaka xwe ya dîrokî de dijîn. Tê wateyê ku Emerîka wan di xizmeta berjewendiyên xwe bikartînin, û gelê Kurd û wan bi tenê hiştin wek Efrînê ku di bazara siyaseta navdewletî hat firotin û dewleta Tirkîyê wê dagîrker û grûpên çekdar yê terorîst wê talankirin, herwiha anha piştî ku serokê Emerîka Donald Trump ragihand ku hêzên xwe ji Sûriya vekişîne, êdî Rojhilatê çemê Feratê jî dikeve metirsiya êrîşkirina dewleta Tirkîyayê ya dagirker ku senaryoya Efrînê pêkbînin, û milletê kurd neçar û penaber bibin. Jiber vê yekê divê PYD'ê vegere ji siyaseta xwe ya yekalî, û bi erkekî neteweyî li ser avakirina yekrêziya mala kurdî re xebat bikin !! ku ew bûn lîstok û pêkenok û dar di destê dewletan de û wan bi karanîn li gorî berjewendiyên xwe. Tenê ji tevgera siyasî ya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê û bi taybet (ENKS ê û TEV DEM) di vê dema hestiyar û awarte tê xwestin ku berjewendiyên gelê kurd bidin pêş çavên xwe û berjewendiyên kesayetî û partî bidin aliyekî û bi yek helwest, nerîn û siyaseta xebat bikin, û di bin yek al û dirûşm bi hêzeke leşkerî canfeda bin, û xaka Rojavayê Kurdistanê biparêzin ji dest dirêjî û metirsiya êrîşkirina dewleta Tirkîyê ya dagîrker û qirêj.



Ehmedê Xanî
1651-1707

Ligundekî culemêrg yê bi navê Xanê hatiye dinyayê. Di medreseyan curbecur perwerde bûye. Zarokatiya wî û xortaniya wî di dema ku êrîş û komployên li ser Kurdistanê zêde bûye de derbas dibe. Gelekî di bin bandora êşên ku kurd û welatên wan dijiyan de, dimîne, ji ber vê yekê jî hîn 14 saliyê dest bi nivîsandinê dike. Ji bo welatê xwe û gelê xwe jiyaneke azad û bi şeref di ramiya, li dijî neheqî û bê edaletiyê sekinî. Girêdayî welatê xwe, milletê ku jê ye, bi taybetî jî bengiyê zimanê xwe ye. Bi azadî fikiriye, û fikariya xwe bê tirs nivîsandiyê. Di dinyaya Xanî de tenê rastî heye. Ji ber rûmeta dide zimanê Kurdî, berhemên xwe bi Kurdiyeke herikbar, sade û zengîn nivîsand. Di wêjeya Kurdî derûpeleke nû vekir. Bi vê yekê jî nema û li Bazîdê dibistanek vekir û zarokên Kurdan bi zimanê wan perwerde kir. Bi nêzîkbûneke felsefî jiyan û buyer şirove kir. Lêkolîn kir, mudaxaleyî polîtîkaya wî zimanê kir. Di asta Klasîkên dinyayê de berhem afirand. Berhemên wî li gelek zimanan hate wergirandin, bi dihan çapa wan bû. Li Bazîdê mir. Gora wî li Bazîdê ye û hîna jî ziyaretgeheke girîng ya herêmê ye. Berhemên wî: (Nû Bihara Biçûkan, Mem û Zîn, Eqîda Îmanê, Eqîda Îslamê)...

QASIM
MER'İKA



Melayê

Cizîrî

1570-1640

Li Cizîrê hatiye dinyayê, bavê wî alimekî navdar yê bi navê Şêx Mihemedê. Endamê eşîra Bextiyarî ye. Perwerdehiya xwe ya destpêkê ji bavê xwe wergirt. Navê wî yê rastin, Şêx Ehmedê. Paşê ji Mele Taha ku jî gundê Sitrabaşê ye, perwerdehî dît. Gava ku perwerdehiya xwe temam kir, li gundê Sirbayê melatî kir. Paşê li medreseya Heskîfê dersdarî kir. Piştî kurtedemek vejeriya Cizîrê û li "Mizgefta Sor" ders da. Heta mirina xwe li wir ma. Bi hezaran şagirt perwerde kir. Qet nezewicî û karîn û şiyana xwe bo şagirtên xwe û perwerdehiya wan serifand. Tirba wî li bin mizgefta Sore. Ew der jî hêla Kurdan ve wekî cihekî pîroz tê hesibandin û ziyaretkirin. "Dîwan" a wî ya ku heta roja me hatiye, yek ji berhemên hêja yê edebiyata nivîskî ya Kurdanê. Di helbestên xwe de di bin tesîra tu kesî de nemaye, her wiha di vî warî de ew bixwe ekoleke. Ji bilî şairiya xwe, di warê tesawuf, edebiyat, cografiya û astronomiyê de jî xwediyê zanyariyên kûr bû. Cizîrî yek ji pêşengên wêjeya nivîskî ya Kurda ne....

RAPORT

Encûmen dîrok 7/1/2019

(7)

jmar (10)



Di bin diruşma (em Aştiyê dixwazin em şer naxwazin) îro rêxistina Jina Kurdî ya Azad şahiyek li bajarê Qamişlo lidarxist , bi mêvandariya Hunermend Îmad Darî û Hunermend Welîd bavê Laleş , divê derbarê de Jinek ji amedebûyên vê şahiyê bi navê “Dilxwaz Hemo” ji peyamêrê me re got :” Em spasiya rêxstina Jina Kurdî ya Azad dikin li ser vê şahiya sersalê her tim serkeftin ji bo karê wan , sala were bi kêf û xweşî bi ser milletê kurd de were û azadiya kurdistanê em bibînin, Em xatir ji salekê dixwazin û hêviya me ew e ku sala nû sala aşî û aramiyê bi ser gelê cîhanê bi tevahî û bi taybet bi ser gelê me yê kurd bê “. Belê em tev bi hêviya xweşiyê ne di sala nû de . Ji alîkî dî ve jinek kurd bi navê “Sewsen xelef” ji nûçegihanê mere afixî û got :” Ser keftin ji bo vî karê şahiya sersalê ya ku Jina Azad pê rabûn û sala bê bi kêf û xweşî bi ser kurd kurdistanê re were , û em nema êş û jaran bibînin û sersala nû li gelê me tevan pîroz be , Belê hêviyame ku sala 2019an sala aşiyê û Aramiyê be”.

Pars û windakirina pêşerojên zarokan Yusra Ziber December 31, 2018 Civak, Nûçeyên Kurdistanî, Rojnameya ENKS 21 Views Êşek ji êşên civakî yên giran derbasbûne û bikaranîna parsê li ser destê zarokan nexasim ji destpêka şoreşa Sûrî û ta niha em dibînin ku parsbûn pir bûye û yên ku qurbanîyê mezin datînin di vê riyê de zarok in, di vê derbarê de jinekê ji welatiyan bi navê Helîme Ebdela ji payemêrê me re got: Cîhê zaroka dibistan e û lîstikin, û himbêza dê û bavê ne,ne cade û kolanin, belê li ser vê mijarê jineke din bi navê Hediya Silêman ji payemêrê me re go: birastî cîhê dil êşiyê ye te wêneyên parsê ku em dibînin li ber çavê xwe bi taybet ew zarokê ku destê xwe dirêj dikin li ber her kesî ji bo çend qirûşan, gelo dilê xwediyê wan ji kevir e ku wilo qêmîşî zarokên xwe dikin û wan berdidin cadan û kolanan ev zarokên pêxwas û bê cil di havînan û zivistanan de. ma gelo dê û bav ji wan re tune ne yan keskek berpîrs tune ye ku li ser vê pîrsgirêkê bisekine. bi rastî ne zarokan tenê bikartînin ji bo parsê wek em dibînin ku kesên pûç jî tînin bikaranînin ji bo parsê lê mixabin em nabînin ko kesek li ser vê gunehkariyê bisekinin û çareseriyê jê re bibînin lê mixabin guhdan ji gelek dengên re tune ne ??? Yisra zibêr



Ferhad Şexo



Silêman Oso:

Divê lihevkirinek navdewletî çêbibe ku pêşmergeyên Roj derbasî Kurdistanê Sûrîyê

bibin. Rojnameya Encûmen vê hevpeyvînê ligel siyasetmedar û sekreterê Partîya Yekîti Kurdistanê - Suriya Silêman Oso pêk anî li ser rewşa dawî ya li herêmê derbas dibe : Tu çawa li gefên dewleta Tirkiya ji bo derbaskirina rojhilatê Firatê li Kurdistanê Sûrîyê dinere ? -Em van gefên Tirkiyeyê dibînin bi rastî gefên ji dil in , û metirsike mezin heye ku van gefan di warekî piratîk bi cih bînin, û di heman demê de metirsiyek heye ku Rojhilatê çemê Firatê li Kurdistanê Sûrîyê wekî Efrînê lê were. - Di bawerîya we de heger Pêşmergeyên Rojavayê Kurdistanê "Leşkerê Roj" derbasî Kurdistanê Sûrîyê bibin , wê ew gefê Tirkiya werin rawestandî ? -Heger Pêşmergeyên Roj derbasî Kurdistanê Sûrîyê bibe û li seranserê sînorê navbera Kurdistanê Sûriya û Tirkiya bi cih bibin, di bawerîya me de ev dibe ku lihevkirinek navdewletî li ser vê xalê hebe navbera Emerîka û Tirkiya û PYD'ê ve jî, ji ber ku lihevkirin li ser nebe , pêşmergeyên roj nikarin derbasî Kurdistanê Sûrîyê bibin, û di bawerîya min de Emerîkayê hewldaneke kiriye bi PYD'ê re ji bo derbaskirina Pêşmerge û ev hewldan bi serneket, ji ber PYD'ê qebûl nekiriye ku pêşmergeyên Roj bi vî rengî derbas bibin. Rengê derbasbûna pêşmergan hin ne diyar e, heger erêkirinek û lihevkirinek navdewletî çêbibe wê demê de wê Pêşmerge karibin derbas bibin. -Hûn çawa ragihanda serokê Emerîka "Tiramp" ji bo kişandina leşkerên xwe ji Sûriyayê dinexînin? -Bi rastî biryara ku serokê Emerîka Tiramp ragihand biryareke ji nîşkê ve bû ji hemû çavdêrên siyasî yê ku kirîza sûriyayê dişopînin û hebûna leşkerên Emerîkî li Rojhilata çemê Firatê û wek tê xuyakirin ku Emerîka dixwaze Tirkiyayê razî bike, û ev herêmen ku bin destê wê de ne dixwaze radestî Tirkiyayê bike, ji ber Emerîka dewleteke li berjewendiyên xwe dinere, lewma ew dixwaze ku Tirkiya nêzîkî xwe bike di pêşerojê ji bo milmilaniya wê li dijî Îranê, ji ber ku Tirkiye girînge ji Emerîka re ji ber ku Tirkiye dewleteke xwedî hêz û rol e di NATO de. Û ev jî tê xuyakirin ku Emerîka dixwaze ku Tirkiya ji dest wan neçe ji ber ku Rûsya di dema çû de dixwest Tirkiya nêzîkî aliyê xwe bike.

Şemdîn û Hemdîn xelesa (8)



Luqman Silêman

dinê diya min hîn ciwan e û ez hîn zarokim ma çawe dilê te biyatekir tu bavê min ji paşve bikujê ma gunihê te bi min nehat axa yê min o. ma çawe te qebûl kir ku biraziyê te sêwî li ber dîwarê xelkê li ber destê amo jinê bimînê ma guhinê min çibû te derîkê min girt û çira min ji diniya yê vemirand lo xayîno apo. Hemdîno badikê diya xwe wa Menîca xatûnê rabe rabe yadê dilê min dilekî delo dîne erd û ezman min nahemilînê ez li pêşiya qesasê bavê xwe rûniştîme ez nikarim agir bi hinavê min ketiye kezeba min dibê parçe parçe tev bû terîşê xwînê yadê rabe tu radibê rabe tu narabê sê qesem bi nave xwedê ne tu diya min û ne ez ji tere dibim kurr ji îro pêde gotin û galgala te li min heram be. Hê axa yê min o Mence xatûnê bi destê

Hemdîn girt ji oda Ehmed axa yê delo dîn derket û berê xwe dane konê mezin lê jinik bi aqile dêna xwe dayê go ya rebî lawê min hîn zaroye û qeweta vî zalimî nîne di go lawê min o her tu biya diya xwe bikê sebra xwe bikşîne xweda xefûr û rehîme diniya dûlaba tim di sala li hev nayê salek weka salad î na dûmînê lawê min o berxê bavê min o biya min bike emê weka xwîniya berê xwe bidin welatê xerîb û xurbetê ta ku emrê te bibê sêzde çarde sal bila şîrê min lit e bibê şehîr û sehferan ku ti newê konê xwe li şûna konê apê xwe daney nê lawê min wê çaxê heyfa bavê xwe hilîne berxê bavê min o. Hemdîn biya diya xwe kir li ber konê xwe sekinîn û konê reşê giran li erdê dan û berê xwe dane welatê xerîb û xurbetê sê roj û sê şeva ji welatê Zozanê Şerefdînê dûr ketine gihane mêrgekeka xweş dêna xwe danê kes li wê deverê nîne ne ins û ne cin konê xwe li wir berdana erdê di roj sê roj di ser wan re çûn konê wan weka hêka qitkê bi tenê li wê mêrga şîn . piştî çend roj di ser wan re çûn hin kesê dî hatin kona xwe li dora wa danîn. Hemdîn ji wan pirsî hûn kîne ji kû tîn jêre gotin axa em mehkûm û eşqiyan e em hatine me xwe li nav û dengê te girtiye ji îro pêde ti axa yê me û em xulamê te ji tere fidawîne. Hê hê axa yê min o konê wa heroj zêde dibin çend salê wan qediyar konê wa bûne heştî kon pênc sal di ser wan re bûrîn konê wa bûne sed kon. Rojekî ji rojê buharê birek mitirbê Zozanê welatê Şeref dînê li dana xwe di gerin li wan kona rast hatin Mence xatûnê ji wan di pirsê lawo hûn ji kune? Mitirb dibêjin em ji Zozanê jorîne. Mence xatûnê ji wan re dibêj jib o xwedê hûnê kemaçe û tembûrê xwe bînin û çen dîloka li ser Zozanê jorîn bêjin em gelekî adizin li ser welêt. Mitirba rahişte kemaçe û tembûrê xwe li ser kabê xwe danîn dibêjin xatûna min kolikê dowaz de mîrata li mala Ehmed axa xînê em pêhisar ku wî birayê xwe kuştiye û mala xwe li dozdeh mîrata di gerîne çawe jinbira wî û biraziyê wî xwînê bûne û bi deriya ketine ji welatê Zozanê jorî barkirine kes nizanê bi ku konê xwe li ku danîne. Hê hê axa yê min û çawe ku Mence xatûnê va gotina di bihîzê çilapekê rondika ji çavê wê di gindirin. Karê Hemdîno bûye nêçîr li wan çol û bêlana êvarî dema ku hate malê dî va diya wî bi mehde jêre got yadê bi sê qesem nave xwedê te bêriya Zozanê jorî kiriye bi qesem nave xwedê ji nûve em hew agir li vir pêdixînin lazim sê rojê min bi qedîn roja care ez konê xwe li şûna konê bavê xwe deynim û gom gom û misînê qehwê pêxînin yadê em ketine welatê xerîbiyê kes me nasnakê û qîmetê mêra nizanê. Yadê em li welatê xerîbiyê ne kes nizanê em kîne û bezê gohê bavê me ji kuye. Yadê dema ku mirov ne li ser axa xwe be kes qîmetê wî nizanê. Êvarî dema ku meclisa wî gera û xelk hatin dora wî dêna xwe danê ku axa yê wa bê mehde. Jê pirsîn xwedê xêrkê axa em sed kon li dora tene em bi sed zilam bi zarok û namûsa xwe ve axa em tev ji tere gorîne. Hemdîn ji wan re dibêjê dilê min dilekî delo dîne ez ne zilamekî bê xwedî me ez xulamê we teva me ez Hemdîn im kurê Hisên axa yê delo dînim xwediyê welatê jorîm e di nav min û apê min de tiştêkî giran çêbûye

Birîna me yeke

Sîmav EFRÎNÊ

Birîna Kobanê û Efrînê yeke

Tucarî kes nikare me ji hev dûr bixe

Ji berxwedniya serdemê re dîroka kela DimDimê
dibareke

Bi serfirazî Serê Kaniyê hembêza xwe yeke

Dilê neyara li me şa neke

Ji dayîkên çav şil re sîngê xwe bibaxçeke

Qamişloka min heya ku Efrîn bihna xwe distîne
evîna xwe ji bîr neke Tenê evîna xwe bi Kurdan

re parveke

Axa cîhanê xwîna pakrewanên me dimêje yek bi yeke

Zarok sêwî ketin ev çi feleke

Dûjeha dûrahiya welat penxaziyo ji bîr neke

Ji hest û ramanên xwe dûrahiya welat çeke

Çiqinên zeytûna ji mêrantiya te berdewam dike

Dayîka şal spî ji hêzên çavên te aram dike

Sîmav EFRÎNÊ#

23/12/ 2018



Bêçarê kurd

Dest bidin hev wek bira?

Min deste dirêj kir,ji bo te bira

Te pişta xwe da min,nizanim çira

Te li pê xwe hîştim berxa dev gura

Ku îro ez çûm sibê li te sira!

Ku ez bûme taştê tuwî firavîn

De were bigre dest ji bo te narvîn

Volqan dikele berî ku birje xwîn

Em herdu li hev li cîhan bin çira!

Ku em bibin yek dijminî pir qels e

Bi destê min û te wê ew bihelse

Bê şer û xwîn ji nava me biteyse

Berî ku sorkin ji xwîn qîlên gura !

Çima?ji bo min tu nabî wek kember

Lê sed mixabin tu dibî wek xençr..?

Berê gotine:"mirin lokê qemer!

îro li min bû,sibê li stukura

B.K.26.12.2018



Emer Isma'îl

Bese parçebûn

Perçe perçe kir kirasê rengîn
Jevkirine tîş ev navê şêrîn
Her yek dibêjî rastim dilbirîn
Tev kirin zîçor kirasê rengîn

Perça jê dibin binavên mezin
Xwe dikin semyan berde dibezin
Gund û bajaran hemîya di gerin
Ji bo navê xwe benda çê dikin

Benda çê dikin karê berberî
Miletê hêja tev kirine kerî
Boça levididin bê şerm û fedî
Mafê me kurda hiştin li berderî

Ev dara bilind çiqil jê birrîn
Birîn û birrîn bûne deh serî
Çiqilê hişkin wek termê mirî
Laşê hevdxin kezeb jê birrî

Vabûne deh tîş li vî parçê me
Govendek vale digêrê li dora me
Em pêş na kevin bi vî rengê me
Xurêl û quncir teji li ngê me

Kanîya zelal tu neke gerav
kurd jê vedixun tu neke çirav
Vê dibistanê rê bikin kulav
Tê de bixwînin wek bira û bav

Biryê delal bese perçe bûn
Birayê hevin xwe ji hev neşûn
Li himber dijmin bi can û bi xwîn
Bi ser bilindî bêjin serxwebûn

Gotina qelew dema wê borî
Dema xebatê li ser kopê jorî
Bakî xweşe tê ji te neborî
Bi hev re rabin canê min gorî

Duhezar û sê xwêsbû li me buhar
Rijêmên xwînmij mane bê sitar
Mirovên zordar li hev bûne mar
Ewrên reşborîn kurdistan buhar

Nebe duparçe nebe du raman
Vê buhara xweş tu bike nîşan
Îro tu tenê qet nayê pîvan
Ev parçebûne yekitî derman

Bese parçebûn bese dubendî
Milet westîya ji vî karê genî
Kêfxweşe dijmin li te dikenî
Royê xwe sipîke bi xwe nekenî

Sitirya rakin bidin hev gula
Berdin roviya ji nava mala
Toleyê dijmin bixînin çala
Destê hev bigrin ji dost û hevala

Em hemî yekin dîrok û ziman
Navê me yeke li nava cîhan
Di vî çerxî de xwe bide nîşan
Li rojhiltê stêrê geş xuyan

Werin xebatê tevbikin dîlan
Li deryê rijêma hûn bikin halan
Dûrî xwe bikin dixokê kurdan
Ev warê meye kurê kurdistan

Ez ezîya we hûn hiştine kor
ker û gêj mane nabînin li dor
Şerê hev dikin biwî çavê sor
Li ser çî milbê di xwazî herî jor

Li hevdo rûnin ser tiştê buha
Tiştê xil û xav bavên pişt guha
Wek sala hevtîyê herin wan ciha
Li rex Barzanî tev bidin guha
Li dora Barzanî bigrin çivatê
Rastbin bi hev re ji bo felatê
Tev xwe xilaskin ji vê kêferatê
Bi yek dil û can herin xebatê